


Gelek mirov ên ku tûşî COVID-19ê bûne dîsa qenc bûne



Gelek mirovên ku tûşî COVID-19ê bûne bi timamî baş dibin. Di piraniya bûyeran de, sîstema jêbexşiyê bi timamî li hember enfeksiyonê şer dike, û eger we di nav 48 saetan de semptom nîşan nedabe, hûn wek qencbûyî tên qebûlkin.

Eger hûn tûşî koronavîrusa nû bin, ev nayê vê wateyê ku hûn ê hemû jiyana xwe ya mayî bi wê nexweşiyê derbas bikin.

Gelek mirovên ku tûş bûne bi awayekî sivik nexweşiyê derbas dikin û pêwîstî bi baldariya tibî nabînin. Eger hûn semptomên COVID-19 nîşan bidin, wek mînak agirê laş û/an jî kuxik, divê hûn li bijîşkê xwe bigerin. Neçin serlêdana bijîşkê xwe an jî neçin odeya acîl eger semptomên we yên COVID-19ê hebin.

Eger testa we ya koronavîrusa nû erênî be (wek mînak test nîşan bide ku hûn tûşbûyî ne), divê hûn xwe ji mirovên din cuda bikin da ku enfeksiyonê derbasî yên din nekin, endamên malbata we jî tê de. Eger xwe cudakirin ji bo we dijwar be, wek mînak ji ber ku hûn di rewşên tengav de dijîn, hûn dikarin li gel şaredariyê bikevin nav têkiliyê ji bo pêşniyarên derbarê derfetên mayîna ciheke li şûna mala we ku li wir hûn bikarin xwe cuda bikin.

Eger hûn bi awayekî giran nexweş bikevin û nizanin bê ka ji we re rakirina nexweşxaneyê pêwîst dike, divê hûn li bijîşkê xwe an jî xizmeta acîl bigerin.